IJOKS
ISSN: 2149-2751
e-ISSN: 2149-2751
International Journal of Kurdish Studies
http://www.ijoks.com/

Research Article

**International Journal of Kurdish Studies**
11 (1), pp. 96-113
http://www.ijoks.com

# Motîfa Marî Dı Bawerîyên Gelêrî Yên Duhokê De

***Israa Musheer Ahmed AHMED***[1]

**Received**: Dec 14, 2024 **Accepted**: Feb 10, 2025

## Kurte

Ev gotar li ser motîva marî hûr dibe ku di baweriyên gelêrî yên Duhokê de semboleke girîng e. Armanca gotarê vekolandin û vebeyankirina aliyên nepenî yên Duhokê ye ku di berdewamiya tarîxê de mazûvaniya gelek şaristaniyan kiriye. Di vê peywendê de bi rêya hevpeyvînên ligel xelkê Duhokê, hat dîtin ku motîfa marî di berdewamiya tarîxa de û di çandên cuda de wateyên xwe yên kûr ên sembolîk heye û hem bi temsîlên başiyê û hem jî bi yên xirabiyê hatiye peywestin. Dîsa, ji bo ku motîfa marî di baweriyên gelêrî yên Duhokê de baştir bê famkirin, me berê xwe da rol û wateyên marî yên cuda di şaristanyên rojhilat û rojava yên wekî Misir, Çîn, Hind, Yewnan, Îran û Tirkî de. Wekî encam, bi rêya daneyên ku ji herêmê hatine berhevkirin, hat tesbîtkirin ku mar li Duhokê hem wekî bûnewerekî xeternak û xapînok û hem jî wekî çavkaniya şifa û bereketê tê dîtin.

**Peyvên Sereke:** Duhok, Gel, Bawerî, Mar, Marê Reş

**Recommended citation:**
Ahmed, I. M. A. (2025). Motîfa Marî Dı Bawerîyên Gelêrî Yên Duhokê De. *International Journal of Kurdish Studies,Volume 11* (1), 96-113, **DOI**: **https://doi.org/10.21600/ijoks.1600449**

[1] Ph.D. Can, On Dokuz Mayis University, Türkiye, e-mail: sraamusheer1@gmail.com,
**ORCID**: https://orcid.org/0009-0003-6843-1907

**Snake Motif in Duhok Folk Beliefs**

**Abstract**

In context of folk belief, serpent symbols carry deep symbolic meanings, especially evident in Duhok—in the Kurdistan region of present-day Iraq. The aim of the present paper is to bring to light and explore the mysteries of Duhok, a city and province where Kurdish is spoken and which has a history dating back to Sumerian civilization. Through interviews with the people of Duhok, the serpent motif of various cultures throughout a long history of passing civilizations has come to light. In addition, Babylonian, Egyptian, Chinese, Hindu, Greek, Iranian, and Turkish folklores are explored. The symbolic meanings though one and all have been associated with both positive and negative characteristics. As a result of this research, and based on the information collected through extensive fieldwork, it has been determined that in Duhok too the serpent is viewed not only as a source of healing and prosperity, as commonly believed, but also as a dangerous and deceptive creature.

**Keywords**: Duhok, Folk, Beliefs, Snake, Black Snake.

**Destpêk**

Di berdewamiya tarîxê de, maran di nava gelek çandên cuda de wekî bûnewerên xwedî wateyên sembolîk ên kûr û ligel hêzên cuda pêwendîdar, cih girtine. Digel ku mar di gelek çandan de bûne sembolên hikmetê, nûbûn û veguherînê, bi heman awayî bi xetere, xirabî û mirinê re jî hatine peywestin. Armanca vê gotarê jî ew e ku cihê motîfa marî yê di baweriyên Duhokê de, peywenda tarîxî û çandî ya vê motîfê vekole. Di vekolînê de em li bersiva van pirsan digerin: Di nava gelê Duhokê de wateyên erênî û neyînî yên motîfa marî çi ne? Gelo di berdewamiya tarîxê de ev wateyên heyî gelê Duhokê ketiye bin bandora baweriyên maran ên şaristaniyên cihê? Morîfa marî di mîrateya çandî ya Duhokê de cihekî xwe yê çawa heye?

Peydakirina bersiva van pirsan ji bo famkirina mîrateya dewlemend a çanda Duhokê û ji bo tesbîtkirina girîngiya sembolîk a motîfa marî ya li herêmê giring e. Wextê rol û wateyên motîfa marî yên di şaristaniyên cuda de bêne vekolan, dê bê famkirin ku baweriyên gelê Duhokê yên derbarê marî de di vê peywenda berfireh ya çandî û tarîxî de şikil girtiye. Di nava feydeyên

pratîkî yên lêkolînê de, zêdetir fehmkirin û parastina mîrateya çandî ya Duhokê û bi perspektîfeke berfirehtir nirxandina temsîla motîfa marî ya li herêmê cih digirin.

Çarçoveya giştî ya xebatê, ji baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê marî de û têkiliya van baweriyan a ligel mîtolojiyên şaristaniyên cuda cuda pêk tê. Di mîtolojiyên Sumer, Babîl, Misra Kevn, Çîn, Hîndîstan, Îran û Tirkiyeyê de wate û rolên sembolîk ên cuda yên mar bi kurtasî bên nirxandin û cihê vê motîfê di mejiyê gelê Duhokê de bê analîzkirin. Dîsa di berhemên tarîxî yên Duhokê de bikaranîna motîfa marî û di kevneşopiya devkî ya xelkê de baweriyên derbarî marî de dê cih bigirin.

Ev gotar, armanc dike ku motîfa marî ya di baweriyên gelêrî yên Duhokê de, çawa hem wekî hebûneke xeternak û xapînok û hem jî wekî çavkaniya şîfa û bereketê tê dîtin.

**Rêbaz**

Di vê lêkolînê de motîfa mar di baweriyên gelêrî yên Duhokê de hatiye rawestîn û ji bo têgihîştina motîfê Marî bi rêbazeke lêkolînê ya raveker/kalîteyî hatiye bikaranîn. Lêkolîna kalîteyê ji ‘’rêbazek e ku lêkolîner e, şiroveker e û hewl dide ku pirsgirêkê di hawîrdora wê ya xwezayî de fam bike’’ (Baltacı 2019: 396). Ji bilî ku lêkolîn bi modela lêgerînê hat kirin û li ser wateyên sembolîk ên baweriyên herêma Duhokê hatin rawestîn.

**Sêwirandina Lêkolînê**

Lêkolîn pala xwe dide lêgerîna wesfî. Ev lêgerîn/model ji bo bidestxistina agahiyên berfireh derbarê mijarekê de, dahûrandina çavkaniyên heyî û hevpeyvînên ligel beşdaran di nava xwe dihewîne. Di vê lêkolînê de, bi nivîsên rojhilatnasên wek Basili Nitikin (Nitikin 2007: 408-413) û Toma Bua (Bua 1980: 220), ku bala xwe didin lêkolîna civaka kurdî, bi nivîsên lêkolînerên herêmê, ji mîrata devkî ya herêmê û her weha bi lêgeryana bersivên hindek pirsên wekî: we li ser maran çi bihîstiye? Ma mar heywanekî bêbext e? Hûn marê reş dikujîn, eger na, çima? Têkiliya mar bi bihuşt û dojehê re çi ye? Mar di dermankirina dermanên alternatîf de têne bikar anîn? Di baweriya we de pîroziya mar heye? Di hevpeyvînên ku li Duhokê hatine kirin hewl hatiye dayîn ku sembola mar di baweriyên gelêrî yên herêma Duhokê de were ronîkirin. Bi vî awayî agahiyên berfireh li ser cih û girîngiya motîfa mar di çanda Duhokê de derketine meydanê.

**Qada lêkolînê**

Navçeya lêkolînê bajarê Duhokê ye. Bajarê Duhokê li bakurê rojavayê Herêma Kurdistana Iraqê ye. Bajar 50 km ji sînorê Tirkiye-Iraqê, 67 km ji sînorê Sûriyê, 153 km ji Îranê û 475 km ji Bexdayê dûr e (Husın 2024: 11).

Sedema sereke ya ku Duhok wek qada lêkolînê hatiye hilbijartin ew e ku ev herêm di dirêjahiya dîrokê de mazûvaniya şaristaniyên cihê kiriye. Mînak, eslê bajêr ji Serdema Paleolîtîk vedigere. Encamên arkeolojîk diyar dikin ku dîroka Şikefta Çarşetînê ya li ser Tengava Dihokê vedigere serdema kevirê navîn û tomarên herî kevn jî vedigere sala 1200 berî zayînê. Wekî din, delîl hene ku şikefta Helamata ya li Çiyayê Zawa, ku wekî Çiyayê Reş tê zanîn, bi heman rengî di seranserê dîrokê de wekî cihekî îbadetê hatiye bikaranîn (Osu 2022: 19). Di destpêka hezarsala sêyemîn a berî zayînê de, herêma Duhokê beşek ji Dewleta Subartû bû. Di navbera salên 2371 û 2230 berî zayînê de herêm ketiye bin desthilatdariya Dewleta Akad. Di dawiya hezarsala sêyem berî zayînê de, Duhok kete bin bandora Hûriyan û kete nav qada bandora Hûriyan (El-Zebari 1997: 72-73). Di sala 612 berî zayînê de piştî hilweşîna Împaratoriya Asûriyan, Duhok kete bin kontrola Împaratoriya Medyayê. Paşê, di sala 156 b.z. de, Duhok kete bin desthilatdariya Împeratoriya Farisî ya Axamenişiyan. Di navbera salên 331 û 147 berî zayînê de, bi ketina Îskenderê Makedonî re ku welatên rojhilat bi dest xist, Duhok kete bin kontrola Îskender û bû yek ji baregehên girîng ên fermandarên wî. Ev serdem wekî serdema Dewleta Selûkîyan (Aryen 1965: 268). Di navbera salên 147 berî zayînê û 225ê zayînê de, Duhok kete bin kontrola Împaratoriya Partan (Scanian). Di vê serdemê de Kurdistan bû sê herêm û Bakurê Kurdistanê û herêma Bahdînan jî bû beşek ji herêma Kurdistanê. Duhok yek ji deverên girîng ên niştecihbûnê yên vê herêmê hatiye dîtin. Di navbera salên 626 û 637 an de Duhok kete bin bandora Împeratoriya Sasaniyan. Di vê pêvajoyê de, şerên dirêj ên di navbera Faris û Romayiyan de bû sedema lawazbûna her du împaratoriyan û vê yekê rê li ber misilmanên ereb vekir ku di sala 640-an de herêmê bi dest bixin (Al-Zebari 1997: 74-75). Di sala 1842an de bi dawîbûna Mîrektiya Bahdînan, Duhok rasterast kete bin desthilatdariya Osmaniyan (Miro 2014: 33). Vê yekê jîngehek dînamîk çêkiriye ku pirrengiya çandî û dewlemendiya Duhokê pêş dixe. Duhok, ku di dirêjahiya dîrokê de şopa gelek şaristaniyan li xwe girtiye, xwedî mîraseke çandî ya pir-qatî ye û lêkolîna vê mîrateyê hem ji bo têgihîştina geşepêdana dîrokî ya herêmê û hem jî ji bo eşkerekirina çawaniya têkeliyên çandî yên cuda li wê deverê ava kiriye, xwedî girîngiyeke mezin

e. Ji ber vê yekê, vekolîneke kûr a pêkhateya çandî û civakî ya Duhokê dê alîkariyeke girîng ji lêkolînên akademîk ên di warê de bike.

**Beşdar**

Di vê lêkolînê de 22 beşdar ji pêkhateyên olî û etnîkî yên cuda ji rûniştvanên navenda Duhokê û çend gundan hatin hilbijartin. Di hilbijartina beşdaran de kesên temenmezin û nexwendewar hatin girtin. Wekî din, kesên ji komên temenên cûda yên ku di dema hevpeyvînê de bi kesê hilbijartî re amade bûn jî beşdar bûn. Beşdaran li ser çanda xwe ya devkî, çîrokên mîtolojîk û serpêhatiyên kesane yên di derbarê motîfa mar de vegotin.

**Amrazên Komkirina Daneyan**

Di pêvajoya berhevkirina daneyan de, ji çavkaniyên li ser herêma Duhokê hatine nivîsandin her wiha bi agahiyên ku ji berhemên wekî El-Cewherî (1978) û tezên masterê yên li ser baweriyên gelêrî yên Tirkî û Kurdî hatine nivîsandin pirsên berhevkirinê hatin afirandin. Di dema hevpeyvînê de ev pirs wek rêber hatin bikaranîn û piştî ku daneyên ku ji hevpeyvînan hatin girtin hatin tomarkirin, bi berfirehî dest bi analîzê kirin.

**Analîza Daneyan**

Daneyên hatine berhevkirin di maweya analîza daneyan de, wateyên erênî û neyînî yên motîfa marî yên di baweriyên gelêrî yên Duhokê de, ligel peywenda wan a tarîxî û çandî hatiye nirxandin.

Ev rêbaz, ji bo ku wateyên ku xelkê Duhokê li motîfa marî bar kirine zêdetir bêne fehmkirin û peywenda vê motîfê ya tarîxî û çandî baştir bê zanîn, çarçoveyeke guncav pêşkêş dike. Encamên lêkolînê, dê bibin alîkar ku em mîrateya dewlemend a Duhokê û cihê motîfa marî ya di nava vê mîrateyê de baştir analîz bikin.

**Motîfa Marî di Şaristaniyên Rojava û Rojhilat de**

Mar di jiyana gelên Rojhilata Nêzîk û bi taybetî jî Mezopotamya de cihekî girîng û jiyanî digire, ji erkên ku jê re hatine dayîn an jî rol û kirinên ku jê re hatine destnîşankirin, ku bi materyalê gihîştiye me diyar dibe. An bermahiyên belgekirî yên piraniya rolên dîrokî Şaristaniya Mezopotamyayê derbas bû. Mîna ku ji şaristaniyên Sumerî, Babîlî û Asûriyan gihîştiye me. Lı

cem Sumeriyan, ku yek ji şaristaniyên herî kevin yên Rojhilata Navîn e, nasnavê herî giring yê Yezdan Tumuz'î ku mezıntırîn xudawendê zayînê û sembola jîyane û mırınê bû lı jem Sumeriya "Marê Mezin" an jî "Marê Asîmanî" ye. Navê Xwedawend Înanayê jî ku jina Dûmûz'î û xwedawenda bedewî, evîn, seks û şerrî "Dayîka Marî ya Mezin" e (Ali 1999: 15-40; Al-Hemdani, 2008, 1-3). Di efsaneyeka Sumerîyan ji da hatiye ku demê Înanna ku daket cihana mirinê, bi "çavê mirinê" li Dumuzî mêze kir û ew radestî cinên zalim û bêrehm kir ku wî bibin dinyaya binî, lê Dûmûziyê destê xwe kire destê mar û lingê wî çand di lingê mar de û ji cinan xilas bû. Bi vî awayî, mar bû sembola jiyana nû (Karmer 2002: 205). Dîsa, Sumeriyan mar wekî sembola şîfa, nemirî û cîhana jêrzemînî dîtine. Sembola yezdanê şîfayê yê Sumeriyan Ningşzida, du marên ku bi çeqê darekê yan jî bi çovekê ve aliqandî ne. Pêwendîdanî marî ya ligel tibê ji ber wê baweriyê ye ku jehriya marî di heman demê de jehrkuj e û nûbûna kevilê marî jî bûye sembola nemirî û ciwaniyê (Mewsuat Alem-ul Adiyan, 2004, 123). Ji aliyê Sumeriyan ve bikarînana mar weke sembola saxbûnê, vedigere ji bu gelek bikaranîna mar di dermanên wan de. Her wekî di belgeyên dîrokî yên girêdayî şaristaniya Sumeran de, delîl hene ku bijîjkên Sumerî di pêvajoyên dermankirinê de mar û marên avê wekî derman bi kar anîne (Kramar 2002: 134). Bi heman rengî, di şaristaniya Babîlê de jî mar yek ji sembolên herî giring ya Marduk, xwedavendê sereke yê bajarê Babîlê ye (Al-Hemdani 2008: 3).

Di Misira Antîk de mar, bûnewerek e ku tê perestin û pîroz e. Awayê perestina marî, bi xwedavend Wadjetê, temsîlkar û parêzvana rojê re eleqedar e. Wadjet di heman demê de wekî parêzvana Çemê Nîlê jî tê zanîn. Rennutê sembola çandînî/palehî û başiyê, bi marê "Jet" ku gerdûn û zemanê ebedî temsîl dike; û Ouroborsê ji terefê Şu û Tefnut ve tê parastin, di nav van figûrên erênî yên marî de ne. Li aliyê din, mar di heman demê de wekî figûrekî temsîla xirabiyê jî hatiye qebûlkirin. Nemaze, Apophis, ku wekî dijminê rojê yê di rêwîtiya şevê de tê zanîn, wekî marekî wisa tê temsîlkirin ku li hemberî hemû xwedavendan derdikeve ji bo ku rojê biparêze û paşê jî wê ji holê rake. Dîsa, wekî heywanekî ku derwazeyên dinyaya din diparêze û çavdêriya wan dike, hatiye sêwirandin û bi vî awayî xwedî rolekî girîng bûye. (Al-Veşahi ve Al Faruk, 2020, 291-292)

Di şaristaniya kevin ya Çînê de mar hem wekî figûrekî erênî û hem yê neyînî derdikeve pêş. Bi aliyê xwe yê erênî, pêwendiya marî bi sembola ejdeha hatiye danîn. Mar, wekî hêza mêrane ya siruştî, yanî sembola "wang" hatiye qebûlkirin. Bi serdema xanedana Xan (B.M. 206-M.220) dibe sembola Împaratorê Kurê Esmanî. Ejdehayê ku di rêzeya bircan a Çînê de wekî heywanê

pêncan cih digire, wekî yek ji bûnewerên çar aliyan, bi Rojhilat tê peywestin û bi cihê hilatina rojê, baranên biharê û berhemdariya giştî tê wesfandin. Baweriyeke wisa heye ku ejdeha ji rûyê zemîn ber bi asîmanî ve bilind dibe û dibe sebebê guregura ewran û baranê, di wextê biharê de. Li aliyê din, mar wekî figûrekî neyînî jî tê dîtin. Mar wekî bûnewerekî xirab û xapîner hatiye pênasekirin, ji ber hinde jî bi îmajeke neyînî hatiye bibîrxistin. Bi rastî jî, di serdemên kevin de, bi taybet jî li qeraxên çemen mezin, mar bi aliyên xwe yên erênî û neyînî wekî Xwedavendên Çeman hatine perestin (Eberhard, 2000,104-106, 332).

Di dîn û mîtolojiyên Hindî de, derbarê maran de baweriyên cuda hene. digel ku Brahmanên Vişnuyî marî wekî mirov an xwedayekî xirab dibînin, Şivayî û Budayî, marî wekî heywanekî wisa dibînin ku ji terefê xuda ve hatiye şandin. Mar, di metnên Budayî de wekî bûnewerekî xweşik û di şiklê mirovan de derbas dibe ku gotinên pesindariyê ji bo Buda dike, wî pîroz dike (Rubben, 1995, 93-94).

Li Îrana qedîm jî wateya li marî tê barkirin bi awayekî paradoksî ye. Digel ku, ji ber jehr û hêza xwe ya kujer bi awayekî giştî wekî sembola hêzên tarî, heyata jêrzemînî û xirabiyê tê dîtin, li aliyê din, bi xwedayê afirînerê dinyayê û xwedayê avên jêrzenînî û hakimê dinyayê tê eleqedarkirin (Çobanoğlu, 2019, 29).

Di baweriyên Ereban yên gelêrî de mar, wextê ku nojdar li hemberî gezkirina wî bêçare diman, sebebê tirs û xofê bû. Di serdemên beriya Îslamê de, ji ber ku mirov hem ji xirabiya wî dûr disekinîn û hem jî qîmeteke manewî didan wî, ew perestine. Di heman demê de, di baweriyên Ereban de mar, bi jiyaneke nû ve hatiye eleqedarkirin (Al-Sehli ve Al-Baş, 2020, 269-271).

Di mîtolojiya Tirkî de, bi taybet jî di Şamanîzmê de, mar bi tenduristî û şifayê hatiye peywestin. Mar wekî ruhê alîkar ê Şamanî dihat qebûlkirin û wisa dihat bawerkirin ku têkiliya wî ligel alema ebedî heye û wekî sembola dermanan dihat dîtin. Dîsa, mar dinyaya jêrzemînî temsîl dike û wekî derwazeyê dinyaya uhrewî tê dîtin; bi wî awayî mar wekî navbeynkarê derbasbûna ji dinyaya fizîkî bo dinyaya uhrewî tê qebûlkirin. Di Şamanîzmê de mar, hem sembola başiyê hem jî ya xirabiyê ye û du rolên xwe hene. Di çanda Tirkî de mar bi giştî wekî “iye (baş)” tê pênasekirin û bi taybet jî marên reş bi malê ve têne eleqedarkirin (Ergun, 2014, 54-55).

Herweha mar di şaristanîyên Rojava jî de cihekî giring digire, di Yewnana Antîk de mar, heywanek e ku bi tenduristî/saxlemiyê pêwendiya wî hatiye danîn. Têgeha tibê ku bi tenduristiyê ve tê girêdan, ligel naveroka xwe ya çavkaniya şifayê, ya ku avên jêrzemînî ew bexşî nebatan kirine, xwe dispêre wê baweriyê ku ji bo heyata mirovan alîkarîya wê heye. Di vê peywendê de,

Asklepios, di mîtolojiya Yewnanê de wekî xwedavendê tib û tenduristiyê tê zanîn. Asklepiosê kurê Apollo û Koronis, bavê Hygeia û hin xwedavendên din e. Li gorî efsaneyan, yekem qralê Atînayê, yek ji bajarên Yewnana Antîk, wekî bûnewerekî nîv mar, nîv mirov hatiye teswîrkirin (Sümer, 2016, 279). Ji bilî vê, bi ejdehayê sembola Herayê, xwedavenda mar a di mîtolojiya Yewnanî de jî, tê eleqedekirin. Ejdeha hem sembola hêza siruştî, hem jî ya hêza qraliyetê tê qebûlkirin. Di mîtolojiya Yewnanî de mar, hem wekî hebûneke hêzdar û efsûnî ya siruştê, hem jî wekî sembola mirin, xapandin û xirabiyê jî tê dîtin (Gören, 2914, 5-41).

Mar, di şerstanîyên Rojava da zêdetrî hemî tıştan ji ramanên Xiristiyan û Cihûyan bandor bûyebı. Dı Cihûtî û Xirîstiyaniyê de mar wekî sembolekî dualî û gunehbar xwe nîşan dide. Ew hem wekî sembola zanînê ligel Mûsa û Îsa dibe yek, hem jî wekî bûnewerekî xirab ku bûye sedemê qewirandina Adem û Hawayê ji bihuştê, tê pênasekirin (Dağışoğlu, 2014, 139-142; Sümer, 2016, 248). Çawa ku di Kitêba Destpêkirinêda tê gotinê: “Ma te ji dara ku min emir kir ku tu jê nexwî xwar?” Adem jî got: “Ew jina ku te da min, ji wê darê da min û min xwar”. . Hingê Xudan Xwedê ji jinê re got: “Te çi kir? ” Jinikê got: Mar ez xapandim û min xwar (Campbell; Moyers 1988:118). Bi vi awayî marê herî girîng di edebiyata rojavayî de marê li Baxçeyê Adenê ye, ku Hewa razî kir ku ji Dara zanîna qencî û xerabiyê bixwe, bi vî awayî Adem û Hewa ji bihiştê derxistin û mirin çêbû. Ji ber vê yekê mar bi zanîn an şehrezayiyê ve, her çend zanîna derewîn an kujer be, û bi tunekirina mirovan re têkildar bû. Li pişt van girêdanan dibe ku fikra ku mar bi serê xwe nemir in, ji ber ku çermê xwe ji xwe dikin; Dibe ku şehrezayiya wê ji ber temenê wê yê mezin an jî pêwendiya wê ya ji nêz ve bi erdê re be, tevî têgînên xerab ên mar, Mesîh gazî şagirtên xwe dike ku "wek maran biaqil bin" (Ferber 1999: 186).

Weke ku tê dîtin, sembola mar fîgureke sembolîk e ku di gelek şaristaniyan de wateyên piralî û cihêreng hildigire û di çandên cuda de bi hebûna aliyên erênî û neyînî tê diyarkirin. Ev sembolîzma cûrbecûr ya mar ji ber cûdahiyên çandî û erdnîgarî ye ku wateyên cihêreng dane vê sembolê. Di gelek şaristaniyên kevnar de, mar bi têgînên saxkirin û dermankirinê re, bi şaristaniyên wekî Sumerî, Yewnanî û Şamanên Tirkan re bi xwedayên saxkirinê û sembolên bijîjkî re têkildar bû. Mînakî, di mîtolojiya Yewnanî de, mar bi xwedayên bijîşkiyê yên wekî Asclepius re têkildar e, di heman demê de Sumeriyan ew wekî sembola nemiriyê û nûbûnê didîtin, û şiyana mar ku çermê xwe rijandibû wekî sembola çerxa jiyanê û berdewamiya jiyanê bikar tînin nemirî.

Wekî din, mar di gelek efsaneyan de bi avên binerdî û binerd ve hatiye girêdan, mîna di mîtolojiya Sumerî, kevnar a Îranî û Tirkî de, li wir wekî mexlûqek ku di tariyê de dijî û xwedî hêza kontrolkirina cîhanên veşartî ye tê dîtin. Lêbelê, tevî vê sembolîzma erênî di hin çandan de, mar di çandên din de jî sembola xirabî û kaosê ye. Mînak, li Misrê kevnar, mar Apophis wekî sembola kaos û wêrankirinê dihat dîtin, lê di çanda kevnar a farisî de ew bi têgînên tarî û tirsê re têkildar bû.

Di çarçoveyên olî û mîtolojîk de, mar xwedî gelek wateyên ku L,li gor olan/dînan diguhere. Mînakî, li Hindistanê, mar bi xwedayên cûda re têkildar in û sembolîzma ku li gorî mezhebên olî diguhere, hildigirin. Gava ku mar ji Budîstan re pîroz tê hesibandin, di Hinduîzmê de ku ew bi xwedayên wekî Vishnu re têkildar e, xwedî girîngiyek sembolîkek cihê ye. Bi heman awayî, bandora çand û erdnîgariyê di sembolîzma mar de bi zelalî diyar dibe, ji ber ku şirovekirina wê di navbera çandan de diguhere. Mînak li Çînê mar bi ejderhayê ve tê girêdan û wekî sembola hêz û bextê tê dîtin, lê di çanda Ereban de gelek caran wekî sembola tirs û xofê tê dîtin.

Bi saya vê pirbûna şiroveyan, diyar dibe ku mar xwedî wateyên kûr û cihêreng ên ji sembolîzma pozîtîf bigire heya xirab, di bin bandora rewşên cihêreng ên çandî, olî û erdnîgarî de ye ku di nav temenan de şîrove wê çê kirine.

**Motîfa Marî di Baweriyên Gelêrî yên Duhokê de**

Di çanda Kurdî de marî cihekî xwe yê kûr û giring heye. Di çanda Kurdî de mar hem bi aliyên xwe yên erênî, hem jî bi yên neyînî heye. Aliyê baş yê marî di çanda Kurdî de xwe dispêre efsaneya tûfanê de ku li gorî we efsaneyê ya li Duhokê dihate vegêran:

*‘’Keştiya Nuh di lûtkeya Sandal Kolub de bi Çiyayê Şengalê* dikeve. *Tê gotin ku ji xeynî vê lûtkeyê hemû çiya li hemberî Keştiya Heyatê xwe ditewînin û diçin secdeyê. Nuh wiha bangî wî dike: “Ey çiya, ez dizanim ka tu çiqas bi xurûr î û serî li ber kesê natewînî, lê divê te li hemberî Keştiya Heyatê* secde bikira. *Ji ber vê jî ez jî le’netê li te dikim, ey lûtke, li ser te ne fêkî ne jî dar şîn nabin êdî.”* Bi *rastî jî, ji xeynî lûtkeya Sandal Kulob, hemû lûtkeyên cînar bi dar û beran tijî* ne. *Ji ber qelibîna bi lûtkeya* Sandal Kulob, qulek li *keştiyê vedibe û av* dikeve nava *wê. Nuh bi metirsiyê dihese û ji hemû heywanan dipirse ka “kî ji we dê bikare qulê bigire? “Piştî ku em gihiştin bejahiyê ew çi bixwaze ez ê bidimê”, bi wî rengî alikariyê ji wan dixwaze. Piştî wê, mar xwe radipêçe û qulê digire, keştiyê û her tiştê tê de ji noqbûn û xeniqînê xilas dike. Bi vî rengî, bi*

*taybet di nav Êzidiyan de mar wekî sembola nûbûn, zayîn, bereket û şifayê tê dîtin'' (Hurmi, 2000, 77-80).*

Ev bawerî ne tenê di nav Êzidiyan de, herwiha di nav Kurdên Misilman de jî heye. Heya heyamek nêzîk li gelek navendên Kurdan di nava cihêza keçên berzewac de şiklê Şahmaranê cih digirt. Ev şikil li odeya zîfafê dihat daliqandin. Wisa dihat bawerkirin ku şikil dê bereket û bextewariyê bîne; ji wê zêdetir jî wekî sembola zayînê dihat dîtin (Bender, 1996, 78). Digel vê çendê, aliyên marî yên xirab dibe ku bi efsaneya Kawayê Hesinkar re bê peywestin. Li gorî efsaneye, qralê Aşûrê Dehaq, ji ber xirabiya xwe hatiye le'netkirin û li ser milên wî du serên marî derketine. Wextê ev mar birçî dibin, tenê bi mejiyên zarok û ciwanan têr dibin. Qral, her roj ji gundên Kurdan du ciwanan dide kuştin û mejiyên wan dide marên xwe. Kawayê Hesinkar, şeş kurên xwe ji bo marên qralî ji dest dane û ji bo kurê xwe yê mayî planek çêkiriye. Kawa mihan serjê dike û mejiyên wan pêşkêşî maran dike û bi wî rengî bala wan belav dike. Vê rêbazê nîşanî xelkê jî dide. Bi vî rengî, zarok li çiyayan bi azadî dijîn û Kawa jî artêşekê amade dike û dawiyê li rêveberiya qralî tîne. Kawa, piştî ku Dehaq dikuje, agirekî mezin vêdixe ku esmanî ronî dike, bi wî awayî xelk derbasî serdemeke nû dibe (Şelazi, 2018, 92-93).

Heke em bên ser behsa baweriyên marî yên di nava xelkê Duhokê de, dikare bê gotin ku di berdewamiya tarîxê de ji baweriyên şaristaniyên cuda, bandor girtiye. Ev bandor, nîşan dide ku di navbera çand û dînên cuda de wateyên sembolîk ên marî û têkiliyên wan dişibin hev. Mumkin e ku di baweriyên xelkê Duhokê de hem aliyên erênî hem jî yên neyînî yên marî bêne dîtin. Ji bo xelkê Duhokê girîngiya marî ne tenê di baweriyên wan de ye, di heman demê de di avahiyên tarîxî yên bajarî de jî wekî sembolekê hatiye bikaranîn. Bo nimûne, li ser derwazeyê Amêdiyê, ku heyameke dirêj paytexta Mîrektiya Behdînanê bû, şiklê du mar û qertelekî heye, ji ber ku Amêdî navendeke girîng ya tarîxî û çandî ya Duhokê ye, ev sembol girîngiya marî ya ji bo xelkê herêmê nîşan dide. Dîsa, li ser deriyê Lalişê, perestgeha Êzidiyan ya herî mezin a nêzî Duhokê, sembola marekî reş heye û ev jî nîşaneya girîngiya marî ye li herêmê.

Li gorî baweriyên gelêrî yên Duhokê, mar heywanekî zêde xapînok û xirab e û ji ber vê jî Xwedayî lingên wî li nava zikê wî de hêlane (K.b 3, 9). Xelkê Duhokê wisa bawer dike ku mar ji axê xwe têr dike (K.b 14; Cafer, 1993, 61). Dîsa li gorî xelkê Duhokê mar nemir e. Li gorî wan, li ser erdê mar ewqas mezin dibin ku êdî cihê wan namîne, li asîmanan du milyaket bi zincîran wan radikin û diavêjin cehennemê (K.b 2, 7, 8, 14, 15, 16, 17, 18; Bafi 1999, 43; Saaid, 2011, 30). Derbarê vê baweriyê de kesekî çavkanî tiştê ku bihîstiye wiha dibêje: "min bi xwe bihîst,

hevalekî bavê min got, rojekê ez çûbûm daran, min dît ku ji esmanî zincîrek daket xwarê, li ber çavên min marekî mezin girê dan û ber bi esmanî ve birin” (K.b 17).

Xelkê Duhokê wisa bawer dike ku mar şifabexş e. Bo nimûne, wisa tê bawerkirin ku heke hûn kevilê marî bi pirça xwe ve girê bidin ew ê dirêj bibe (K.b 8, 9; 1993, 27). Heke hûn kevilê marî li pêyên xwe bidin, hûn ê bi leztir bibezin (Bafî, 1999, 43).

Xelkê Duhokê digel ku bi awayekî giştî bawer dike ku mar bûnewerekî xirab e, rêzeke zêde li hemberî marê reş nîşan dide. Em dikarin bibêjin ku baweriya Êzdiyan ya derbarê marên reş de, bandor li ser Kurdên Misilman jî kiriye. Li gorî baweriya gelêrî ya Duhokê, marê reş nayê kuştin, wisa tê bawerkirin ku ev mar ji bo birînên marên din dibe şifa. Dîsa, xelkê Duhokê wisa bawer dike, dibe ku ecin ketibin kirasê marê reş. Ji ber vê jî, sê caran ji marê reş re dibêjin “here”, heke mar digel vê hişyariyê jî neçe, wê demê dizanin ku ew mar e û dikarin wî bikujin (K.b 4, 5, 6, 5, 10, 11, 12, 13, 84, 14, 18, 19, 20, 21, 22). Li gorî xelkê Duhokê, dibe ku marê reş ecinek be û wisa tê bawerkirin ku ihtimal heye ew aşiqî jinan bibin (K.b 4, 14). Derbarê vê mijarê de kesekî çavkanî bûyereke bi serê wî hatî wiha vedibêje: “Li gundî marek aşiqî jinekê dibe, jinik kengî biçe ber çemî, mar jî tê nik wê û xwe li wê radipêçe. Di serî de wê ji ber tirsê nediwêrî ji mêrê xwe re behsa vê meseleyê bike, lê piştî demekê mecbûr dimîne jê re bibêje û gundî tên marî dikujin. Lê gundiyan digot ku kuştina marî guneh e û ew tenê aşiq bûye.” (K.b 14). Motîfa aşiqbûna marî ya mirovekê, bi taybet jî ya jinekê, hemlehiştina jinekê yan jî revandina keçekê tenê bi baweriyên Duhokê ve sînordar nîne, di nava motîfên cuda yên cîhanê de jî tên dîtin. Vegêranên bi vî rengî bi taybet di mîtolojiya Yewnanî de zêde cih digirin. Dîsa, motîfên bi vî rengî di cîhana Tirkî de jî, li çendîn herêman derdikeve pêş me. Bo nimûne, di nav Tirkên Çuvaş de di efsaneya “Guguk (Pepûk), Kirlangiç (Hechecik), Kuyruksallayan” (Tûtirwask) de tê behskirin ku marek keçeke di avê de bi darê zorê ji xwe re dike jin û ji vê zewacê du zarokên wan çêdibin, piştî keçik bi yekî din re dizevice bi salan wê teqîb dike, piştî mirina keçikê mar jî ji ber xema wê li ser mezarê wê xwe dikuje (Yiğit, 2018, 282).

Baweriyeke din heye di nava xelkê Duhokê de ku mirov ji kuştina maran dûr disekinin, li gorî vê baweriyê wextê marek tê kuştin, dayik, bav yan jî yek ji xizmên wî ji bo tola xwe tên. Bi taybet wextê marek mê bê kuştin, heft salan mar ji bo tola wê dikevin pey vî kesî (K.b 14, 17; Saaid, 2021, 31)

Yek ji baweriyên di nav xelkê Duhokê de derbarê marî de ew e ku mar bêyî dîtina stêrkan namirin; ji ber wê jî tê bawerkirin ku heya şevê mar dikarin sax bimînin (K.b 5, 14). Dîsa, tê

bawerkirin ku heke kesek tifî devê marî bike, êdî mar nikarin bi wî kesî vedin (Bafi, 1999, 45). Di baweriya xelkê Duhokê de mar di xewnê de teqabilî dijminî dike, kesê di xewna xwe de marekî dikuje dê ji dijminê xwe xilas bibe (K.b 1, 3, 5; Cafer, 1993, 12).

Sembolîzma mar û baweriya xelkê Duhokê di dirêjahiya dîrokê de ketiye bin bandora şaristanî û olên curbecur. Em dikarin dikarin van bandoran wiha diyar bikin:

Dîtına mar li cem xelkê Duhokê wek sembola saxkirin û nûbûnê, dişibe girêdana mar bi saxbûn û nemiriyê re li cem Sumeriyan. Marê ku sembola xwedayê şîfayê yê Sumeran Ningşzida bû, dibe ku di vê çandê de jî bibe sedema girêdana mar bi derman û dermanan re. Têkiliya mar bi qencbûn û tenduristiyê re dişibihe sembolîzma Asclepius di mîtolojiya Yewnaniya Kevin de. Ji bilî vê, dîtina mar wekî navgîna derbasbûna ji cîhana fizîkî ber bi cîhana giyanî ve, bi qebûlkirina mar re wekî ruhê alîkarê şaman di Şamanîzma Tirkî de paralele.

Di efsaneya tofana kurdî de, mar Keştiya Nûh rizgar dike, aliyên erênî yên mar radixe ber çavan. Ev bawerî bi sembolîzma erênî ya mar di mîtolojiya Sumerî û Babîlî de hevaheng e. Marên di efsaneya Kawayê Hesinkar de wek sembolên xerabiyê dihatin hesibandin, ku di mîtolojiya Sumerî û Babîlî de dişibihe girêdana maran bi dinyaya jêr û xerabiyê re.

Baweriya xelkê Duhokê bi nemiriya mar dişibe hevgirtina mar bi ebedî û gerdûnê re li Misira Kevnare. Wekî din, girêdana mar bi dinyaya binî re bi sembolîzma mar re di mîtolojiya kevnar a Îranî de ye.

Xelkê Duhokê di wê baweriyê de ne ku mar mexlûqên xerab û xapînok in bi tirsa maran di çanda erebî ya berî îslamê de. Di heman demê de cihê taybet ê marê reş di nav kurdan de dikare bi sembolîzma marê reş ve were girêdan.

Ji bo pîvandina van bandoran, mirov dikare wekhevî û cudahiya ayîn û baweriyên xelkê Duhokê yên girêdayî mar bi çandên din re bide ber hev. Wekî din, vekolîna motîfên maran ên di bermahiyên arkeolojîk û berhemên dîrokî de dikare bibe alîkar ku em van bandoran bi zelalî fam bikin. Wek mînak, sembola mar li ber deriyê Amêdî û fîgurên mar li perestgeha Lalişê delîlên fîzîkî yên van têkiliyên çandî ne. Ev remz û çîrokên gelêrî nîşan didin ku xelkê Duhokê çawa ji mar re têdigihin û di bin çi bandorên çandî û olî de ev têgihiştin çêdibe.

**Encam**

Motîfa marî di baweriyên gelêrî yên Duhokê de, herwekî di gelek çandên din de, di berdewamiya tarîxê de xwediyê sembolîzmeke kûr û piralî ye. Mar, ji bo xelkê Duhokê wateyên xwe yên erênî

û neyînî hene û ev bi rabirdûya tarîxî û çandî ya dewlemend a herêmê ve eleqedar e. Rolên ku marî di vegêranên mîtolojik û dînî yên şaristaniyên cuda de hilgirtine, bandor li baweriyên xelkê Duhokê yên derbarê marî de kirine.

Wextê em ji aliyê teorîk ve lê dinêrin, wateyên marî yên sembolik, di baweriyên gelêrî yên Duhokê de hin dijberiyan di nava xwe de dihewînin. Ji aliyekî ve mar bi xisûsiyetên erênî yên wekî şifa, bereket, nûbûn û zayînê derdikeve pêş, li aliyê din jî wekî sembola xapandin, xirabî û xetereyê. Ev her du alî, nîşan didin ka marî cihekî çawa kûr di nasnameya çandî û dînî ya xelkê Duhokê de heye.

Ji aliyê sepanên pratîkî ve jî, tê dîtin ku motîfa marî di jiyana rojane û rîtuelên xelkê Duhokê de, rolekî sereke gêraye. Bo nimûne, baweriya ku divê marê reş neyê kuştin, wekî encama têkiliya çandî ya Kurdên Êzidî û Misilman derketiye meydanê. Ev bawerî, bi fikra ku mar dikare şifayê bide, yan jî dikare bikeve kirasê cinan, piştrast dibe. Dîsa, girêdana kevilê marî bi pirçê ve an jî lêdana wê bi pêyan ve, bi daxwaza bidestxistina şifa û hêzê ye.

Prensîb û nezerên giştî, nîşan didin ku motîfa marî ji bo xelkê Duhokê ne tenê semboleke heywanî ye, ji wê derbas dibe û xwedî wateyeke kûr a çandî û manewî ye. Wateyên marî yên neyînî yên wekî metirsî û dijminatiyê, di nava xelkê de bûye sedemê tirsa tolhildanê ku bi kuştina marî dibe ku derkeve pêşiya wan. Ev jî nîşan dide ku mar bûnewerek wisa ye ku mirov hem ji wî ditirsin, hem jî li hemberî wî rêzdar in.

Dema em îstîsna û daneyên berbelav jî li ber nezerê digirin, digel ku mar di nav xelkê Duhokê de wekî bûnewerekî xirab tê dîtin, baweriya ku marê reş cihekê xwe yê taybet heye û nayê kuştin, dewlemendiya çandî ya vê motîfê nîşan dide. Ev sembolên di navbera xwe de nakok, nîşan didin ku ji bo xelkê Duhokê mar wateyeke xwe ya tebeqeyî heye û di baweriya xelkê de cihekî xwe yê kûr heye.

Wekî encam, motîfa di baweriyên gelêrî yên Duhokê de, semboleke piralî ye ku bi têkiliyên tarîxî û çandî çêbûye. Aliyên erênî û neyînî yên marî, di nav bawerî û rîtuelên xelkê de cihê xwe yên giring hene.

## Çavkanî

### Çavkaniyên Nivîskî

Al-Hemdani, A. (2008). ‘‘Mekanet-l Afaa fi Almutakadat Al-rafideyin’’ (Di Baweriyên Mezopotamyayê de Cihê Marî). Kovara Edebiyatê ya Sumerê. Hejmar: 3: 1-13.

Ali, F. A. (1999). El-Iştar we Measat Tummuz (Iştar û Tırajîdîya Tummuzî). Dîmeşk: Weşanxaneya Al-Ehali.

Al-Sehli, M. T. ve Al-Baş, H. (2020) Al-Muutakadat Al-Şaabiye fi Al-Turas Al-Arabi (Di Çanda Ereban de Baweriyên Gelêrî). Amman: Weşanxaneya Al-Celil.

Al-Veşahi, M. ve Al-Faruk, R. Ö. (2020). ‘‘ Ramziat Al-tueban fi Al-fani Al-Kıbtii ve Al-islami: (alqarn althaani - alqarn alsaabie eashar almialidi)’’ Di Hunera Kiptî û ya Îslamî de Sembolîzma Marî-: (P.M Sedsala 2-17ê). Kovara JAAUTH. Cild: 19. Hejmar: 8. 291-316.

Al-Zebari, A.D. (September 1997). Duhok Abra Usur Al-Tarihiye Al -Qadime (2500 B.Z.- 640 P.Z). (Duhok di demên kevnare de: (2500 B.Z.- 640 P.Z). Govara Duhok: Hejmar 1: 71-80.

Aryen, Y (1965). Ayam Al-İskender Al-Kebir fi Al-Irak (Rojên Îskenderê Mezin li Iraqê). Wegêr: Cemil, F. Govara Sumer Hejmar 21: 267-300.

Bafi, B. (1999). Bîrûbawerên Kevin di Nav Milletê Kurd da, Duhok: Weşanên Hawar.

Baltacı, A. (2019). Nitel araştırma süreci: Nitel bir araştırma nasıl yapılır? (Pêvajoya lêkolîna kalîteyê: Meriv çawa lêkolînek kalîteyî dike?). Kovara Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Ahî Evran, 5(2), 368-388.

Bender, C. (1996). Kürt Mitolojisi-1. İstanbul: Weşanên Befin.

Bua, T. (1980). Jiyanî Kurdawarî. Wergêr: Heme Kerim, H. Silêmaniyê: Weşanxaneya Zanîngeha Silêmaniyê.

Cafer, H. (1993). Hındek Bawerên Xelkê Badinan. Bexdad: Weşanên Çanda Kurdî.

Campbell, J.; Moyers, B. (1988). The Power of Myth (Hêza Mît). Dewletên Yekbûyî: Weşanxaneya Doubleday

Çobanoğlu, A. (2019). ‘‘Mevlana’nın Mesnevisinde Yılan ve Ejderha Motifi’’. 9. Milletlerarası Türk Halk Kültürü Kongresi Türk Halk Edebiyatı Bildirim Kitabı. Ankara.

Dağışoğlu, A. E. (2014). ‘‘Anadolu Türkülerinde Yılan Motifi ve Nefs’’. Yılan Kitabı: Ed. Naskali, E. G. İstanbul: Weşanên Kitabevi.

Eberhard, W. (2000). Çin Simgeleri Sözlüğü Çin Hayatı ve Düşüncesinde Gizli Simgeler. Çev. Kazancıgil, A.; Bereket, A. İstanbul: Weşanên Kabalcı.

Ergun, P. (2014). ‘‘Şaman/ Kam ve Yılan’’. Yılan Kitabı: Ed. Naskali, E. G. İstanbul: Weşanên Kitabevi.

Ferber, M. (1999). A Dictionary of Literary Symbols. Second edition. New York: Cambridge University Press.

Hurmi, H. (2000). ‘‘Al-heyye fi Mitolojiya Al-kedime ve Al-Ezdiye’’ (Di Êzidî û Mîtolojiyên Kevin de Mar. Kovara Laliş, 12, 60-85.

Husın, S. (2024). Analysis of Suryan Migration in Duhok City in Terms of Integration. Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Harranê, Teza PhD, Şanliurfa.

Karmer, S. N. (2002). Sümerler (Tarihleri, Kültürleri ve Karakterleri) (Sumerî (Dîrok, Çand û Karakterên Wan). Wergêr: Buze, Ö. İstanbul: Weşanên Kabalcı.

Mewsuat Alem-ul Adiyan (Ansîklopediya Cîhana Dînan Dinler). Komeke Lêkolerên Pispor. Edîtor: Muferç, A. Cild: 2. 2. B. Beyrûd: Nobili .

Miro, H. O. (2014). Duhok 1945-1975. Midûriyeta Weşan û Çapkirinê: Duhok

Nitikin, B. (2007). Al-Kurd (Kurdan). Wergêr: Nurî Talebanî. Silêmaniyê: Weqfa Hemdî ya Çap û Weşanê.

Osu, H. A. (2022). İstiraticiyat Tadwir Al-Siyaha fi Muhavazat Duhok (Stratejiyen Pêşvebirina Tûrîzmê li Parêzgeha Duhokê). Duhok: Weşanên Seydo.

Ruben, W. (2000). Eski Metinlere Göre Budizm. Haz. Boztürk, L. Ankara: Okyanus Yayıncılık ve Yapımcılık Yayınları.

Saaid, N. M. (2011). Hın Aliyen Civake Kurdi d Kültüre Geleride (Hin Aliyên Civaka Kurdan di Çanda Gelêrî de). Duhok: Midûriyeta Giştî ya Weşan û Rojnamegeriyê.

Sümer, N. (Sonbahar 2016). ‘‘Dinsel ve Mitolojik Bir Sembol Olarak Yılan’’. The Journal of Academic Social Science 43, 275-288.

Şelazi, C. M. (2018). Remzê Marî di Edebiyata Kurdî da. Duhok: Enstîtuya Kelepûre Kurdi.

Yiğit, N. H. (2018). ‘‘Türk Dünyası Efsanelerinde Hayvanlarla İlgili Motifler Üzerine’’. Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi 59 (11), 278-288.

**Çavkaniyên zindî**

| **Kode** | **Nav** | **Paşnav** | **Temen** | **Perwerde** | **Pîşe** | **Tarîxa** | **Navnîşan** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|

| **Bej.** | | | | | | **Hevdîtinê** | **a Hevdîtinê** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1. | Ahmet | Muhammad | 75 | Xwendin-Nivîsîn Nîne | Cotkar | 01.09.2023 | Şeladizê |
| 2. | Haci | Haris | 72 | Lîsans | Mamosteyê Teqawitbûyî | 31.08.2023 | Duhok Navend |
| 3. | Halit | Xizir | 76 | Lîsans | Mamosteyê Teqawitbûyî | 24.08.2023 | Navçeya Akreyê |
| 4. | Îsmaîl | Şahîn | 66 | Lîsans | Mamosteyê Teqawitbûyî | 23.08.2022 | Semel |
| 5. | Cemîl | Şelazî | 53 | Pêş-Lîsans | Mamoste | 01.09.2023 | Kediş |
| 6. | Saîd | Sofî | 86 | Xwendin-Nivîsîn Nîne | Xebatkarê Mizgeftê | 24.08.2023 | Navçeya Akre |
| 7. | Şikirîya | Salih | 77 | Xwendin-Nivîsîn Nîne | Kabanî | 29.08.2023 | Girdesin |
| 8. | Huda | Tîtep | 43 | Dibistana navîn | Kabanî | 29.08.2023 | Girdesin |
| 9. | Jiyan | Musa | 38 | Xwendin geha Navîn | Kabanî | 21.01.2024 | Duhok Navend |

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 10. | Delal | Muhsin | 43 | Lîse | Kabanî | 28.01.2024 | Duhok Navend |
| 11. | Ronahî | Emer | 50 | Lîse | Kabanî | 28.01.2024 | Duhok Navend |
| 12. | Bûşra | Atrûşî | 58 | Lîsans | Kabanî | 28.01.2028 | Duhok Navend |
| 13. | Sure | Gergerî | 50 | Lîsans | Hekîm | 28.01.2024 | Duhok Navend |
| 14. | Heyat | Salih | 82 | Xwendin-Nivîsîn Nîne | Kabanî | 23.02.2024 | Online |
| 15. | Aryan | Silêman | 22 | Xwendin geha Navîn | Kabanî | 23.02.2024 | Online |
| 16. | Nejîbe | Husên | 47 | Xwendin geha Seretayî | Dirûnkar | 23.02.2024 | Online |
| 17. | Lumya | Husên | 41 | Pêş Lîsans | Mamoste | 23.02.2024 | Online |
| 18. | Wecîde | Husên | 46 | Xwendin geha Seretayî | Kabanî | 23.02.2024 | Online |
| 19. | Lelîxan | Îbrahîm | 74 | Xwendin-Nivîsîn Nîne | Kabanî | 27.02.2024 | Online |
| 20. | Zeynep | Şemsedîn | 94 | Xwendin-Nivîsîn Nîne | Kabanî | 29.02.2024 | Online |
| 21. | Asya | Tawfîq | 71 | Xwendin-Nivîsîn Nîne | Kabanî | 29.02.2024 | Online |
| 22. | Cîhan | Geyaz | 35 | Lîsansa Bilind | Akademîsyen | 29.02.2024 | Online |